

Dumahîk : Careke din...

Bide.Tevî ku, ta niha bûye çend car ku, ahengên Newrozê tên rawestandî. Lê belê, tu partî, tu rêxistin û hêzên Siyasî yên Kurd li Sûryê, bi şêweyekî berpirsane li ser rewşên ku, kanibin şahiyên Newrozê biskînînin, ranewstine. Em tev dizanin, ku, gelek cejin û boneyên gelê Kurd hene, lê roja îro, Newroz li ba gelê Kurd, bûye cejna gelêrî û netewî û ya herî gewre jî. Gel bi zorê û bi xwîna ciwanemergên xwe Newroza xwe vejandiye û diparêze. Ji ber wê jî, gava ku ew ji bo armancên siyasî yên teng û biçûk, yan qezencên partiyane, yan kesane were bikaranîn û ji hêla siyastvana ve dakeve mêzîna kar û zirareke ne hêja, ew tirsek îjdil li ba cemawerê Kurd peyda dike, û bi çavê gumanê li biryarên lezok û gumandar tê nêrîn, û gelê me bi îjdilî li sedeman dipirse û paş wan vedide. Netenê wilo, rewşeke nakokiyê jî di navbera herdu aliyan, gel û partiyên Kurd de, peyda dibe û rêzdariya biryarên partiyên û tevahiya tevgerê dadigere. Ev jî tiştêkî zor bivehe, ji ber ku hêz û nixdariya Tevgerê ji nav gelê tê. Û eger dilsozî û bawerî di nav herdu aliyan de lawaz bibe, doza gelê Kurd zîyanê dê bibîne û helwesta dijminên azadiyê xurt dike. Ev rewş, û pirsgerêkên ku, ji biryarên rawestandîna ahengên Newrozê peyda dibin, pêwîst dike, ku rêbertiyên Partî û Tevgera me ya siyasî, bi awakî diyar û xebatkarane li derbarê pirsê Newrozê rawestin û hîmên bingehîn ji lidarxistinê û lidarnexistina mehrecanên wê re nas bikin. Zor pêwîst e, ku sedem û pêwîstiyên sereke û navnîşanên qalîng ji rawestandîna wê re werin naskirin. Ji ber ku, gava ku , ew eger werin diyarkirin, biryarên şaş dê pir hindik bibin, û hemî hêzên me yên Siyasî û li serê hemiyan cemawerê me, dê bi biryarên tvegera xwe bawer bibin û pê bikin.

Belê.. û zor pêwîst e jî, ku ew babet ji roja îro de were vekolan û naskirin

Dûmahîka rojnamegeriya

***M.Bavê Şino** (Çalakvan û siyasetmedar): Bi rastî, ev roj rojêke xweş û pîroz e. Dema em rewşên bîr, siyasetmedar û hemî çalakvanên civaka sîvîl dest bidin hev, em dikarin karekî hêja ji bo gel û welatê xwe bikin. Ez cejna hemî rojnamevan, rewşên bîr û xebatkarên azadî û aştiyê pîroz dikim.

***.Ebdella Hac Eyûb**(Niştimanperwer):Ez rojnama kurdî pîroz dikim, kombûna rewşên bîran di ahengeke halo de gelek xweş e, û bi rastî ew ciyê serbilindiyê ye. Derbarê rojnamevaniyê de kêmasî hene, lê ,ew baş bi rola xwe radibin bo xizmeta doza kurd . Li dawî,ez pîroziya partiya Yekîtiyê ya demoqrata dikim ku, ev roja pîroz ji me re li dar xist.

***M.E.helîm**(Rewşên bîr):Berî 110salan, ev berhema derketî gelek hêja ye, ya iliktronî gelek li pêş e , û xwezî ya nivîskî jî wilo be. Hêviya min ewe ku, yekîtiyek ji rojnamevanan re çêbibe.

***M.E.hekîm Mele Hacî**(Rewşên bîr) :Rojek pîroz e, û ev bûye cejnêk ji bo daneheva van rewşên bîrên Kurd. Hêviya min ewe ku, rewşên bîr berjewendîya gelê xwe tim li pêş bigrin .

***M.şerîf**(Rewşên bîr):

Sipas ji weşana Newroz re ,û ji partiya Yekîtiya demoqrata re, ku van ahengan pêk tîne . Gerek tiştin heftiyane derkevin û nemînin heyva ne û bi keve aliyê niştimanî bihtir ji aliyê siyasî .

***M.Xalis Misewer**(Nivîskar):Ev kar ciyê sipasiyê ye. Dema rewşên bîr li hev dicivin, gerek em guhdariyê li hev bikin, rojnamevan bihtir bi rola xwe rabe ,û rola jina Kurd jî tê de hebê .

***M.Ehmed**

Ismayil(Şanoger):Rojnamegeriya kurdî di dîrokê de, di hemî aliyan de bi roleke mezin rabûye. Ez vê rojê li rojnamê û karmendên wê jî pîroz dikim. **ÇOLBISTAN**